# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (238) | Sibat / 1-2-2023


# Revandina endam û alîgirên ENKS li dijî binemayên mafên mirovan e




**Kurdistan**

Emîndariya Giştî ya Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS daxuyaniyek derbarê girtina endamê Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya yê bi navê Necim Xencer belav kir û têde ragihand, roja şemiyê 28 Çileya Paşîn ji gundê Bane Şikeftê yê ser bi Dêrikê ve Necim Xencer ji aliyê çekdarên ser bi Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD ve hatiye revandin. Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS ev kiryar Şermezar kir û ragehand, ev yek li dijî binemayên mafên mirovan e û di çarçoveya siyaseta qedexekirina karê siyasî li ser Encûmena Niştîmaniya Kurdî li Sûriyê ENKS de tê. ENKS daxwaz ji hemû aliyên peywendîdar û hêz û rêxistinên baweriya wan bi azadiyê tê dike van kiryaran şermezar bikin ku dibin sedema koçberkirina zêde ya welatiyên Kurdistana Sûriyê, û pêwîste PYD dest ji kiryarên xwe berde û tevahiya revandiyan serbest berde û rêzê li azadiya raderbirînê û karê siyasî bike.


**Kobanê bi biryareke dîrokî ya serok Barzanî hat rizgarkirin** *Rûpel—2*

**Îdrîs Barzanî têkoşerekî bêhempa** *Rûpel—3*

**Komeleya Kurdî-Elmanî li Schleswig-Flensburg hate damezirandin** *Rûpel—4*

# Kobanê bi biryareke dîrokî ya serok Barzanî hat rizgarkirin




Di Îlona 2014an de çekdarên DAIŞê bi tevahiya karînên xwe êrîşî ser Kobanê kirin. Di destpêka de, DAIŞê dora 350 gundên Kobanî kontrol bikin ku di encamê de nêzîkî 400 hezar kes derbeder bûn û berên xwe dan bajarên Bakurê Kurdistanê. Êrîşên DAIŞê roj bi rojê zêdetir dibûn û rûbera kontrola wan jî berfireh dibû û hewl didan xwe bighînin navenda bajarê Kobanî. Ji ber kêmbûna karînên hêzên li Kobanê di wê demê de û zêdebûna metirsiya DAIŞê li ser bajarên Kurdistana Sûriyê,

> **Biryara serok Barzanî dîrokî bû**

Serok Mesûd Barzanî biryara piştevaniya Kobanê da û li ser fermana wî, Parlamentoya Kurdistanê roja 22ê Cotmeha 2014an biryara şandina çek û Pêşmerge ji bo Kobanî da. Hêzên Pêşmerge jî ji Herêma Kurdistanê derbasî Bakurê Kurdistanê bûn, ji wir ve jî roja 28ê Cotmeha 2014an derbasî Kobanê bûn û destdek dan berevaniya li Kobanê. Pêşmerge û hêzên Kurdî dorpêça li ser Kobanê şikandin û karîn bajarê Kobanê û hejmareke mezin ji gundên derdora wê ji destê DAIŞ bi temamî derxin û di 26 Çileya 2015an de serkeftina xwe ragihandin. Piştî 134 rojan ji berxwedana li hember çekdarên DAIŞê, roj bi roj dorpêça li ser şervanan zêdetir dibû, nêzîkî 80 ji sedî ji bajarê Kobanê ket destê teroristên DAIŞê û hezaran jî xelk koçber bû. Wê demê li ser dawaza Serokê Barzanî, hêzên Pêşmergeyên Kurdistanê ji bo Kobanê hatin şandin û bi hevkariya Hevpeymanan,

> **Çûna Pêşmerge hevsengiya şer guhert**

şer di berjewediya Kurdên Kurdistana Sûriyê yekalî bû û tevahiya bajêr hat rizgar bû. Roja 28ê Cotmeha 2014an, yekem karwana hêza Pêşmerge ku hejmara wan 150 Pêşmerge bû, bi çekên sivik û giran bi 40 otomobîlên leşkerî ber bi Kobanê ve bi rê ket û bi dirêjahiya rê ji Başûr, Bakur û heta gihîştina Rojavayê Kurdistanê, welatiyên Kurd bi ala Kurdistanê, sirûda niştimanî, çepik û tilîliyan pêşwazî li hêza Pêşmerge kirin, ji ber ku bi nêrîna Kurdên her çar perçeyên Kurdistanê, şandina hêza Pêşmerge bo Kobanê, bûyereke dîrokî bû. Herwiha şandina hêza Pêşmerge bo Kobanê, karvedaneke navdewletî jî li pey xwe anî û beşeke mezin a medyaya cîhanê rûmala çûna Pêşmergeyan di nava xaka Bakurê Kurdistanê re bo Rojavayê Kurdistanê kirin. Bi gihîştina hêza Pêşmerge re, balansa şer hat guhartin û di demekê de ku tenê ji sedî 20 ji Kobanê di destê şervanan de mabû, Pêşmerge û şervanan mil bi mil hev girtin û rûbirûbûyî DAIŞê bûn.

> **Pêşmerge li Kobanê dastan tomar kirin**

Girê Kaniya Kurdan û taxa Meştel ku dawî xala rojhilatê bajêr bû, ji destê çekdarên DAIŞê derxistin û piştre navenda bajêr jî bi temamî ji DAIŞê pak bikin û Kobanê ji metirsiya ketinê rizgar kirin.  Yekem şehîdê Pêşmerge li bajarê Kobanê yê Kurdistana Sûriyê, Şehîd Zêrevan Ekrem Mizûrî bû, ew ji xelkê devera Barzan e û niha malbata wî li navçeya Soran niştecî ye. Şehîd Zêrevan Ekrem yek ji wan pêşmergeyan bû ku ji Başûrê Kurdistanê ji bo berevaniya Kobanê, çûbû Kurdistana Sûriyê, her li wê derê ji bo ax û netewa xwe giyanê xwe feda kir.

> **Nabe rola Pêşmerge were piştguhkirin**

# Îdrîs Barzanî têkoşerekî bêhempa

**Kurdistan**

36 sal di ser koça dawiyê ya endezyarê aştiyê Îdrîs Barzanî re derbas dibin. Dema rûpelên dîrokê tên vekirin û behsa kesê bi bandor û hêz di dîroka Kurdan de tê kirin, divê navê Îdrîs Barzanî di yek ji wan rûpelan de were dîtin. Heval û hevsengerên Îdrîs Barzanî wî bi endezyarê hewldanên yekrêziya gelê Kurd bi nav dikin.
Îdrîs Barzanî di Adara 1944an de li navçeya Barzanî di hembêza malbatekê de ji dayik bû, ku çavkaniya dîroka Kurdistanê amaje pê tê kirin, "Ji destpêka sedsala 20emîn de bûbû mala mezin ya Kurdeyatiyê û sembola neteweyî û rûgeha têkoşerên Kurd."



Îdrîs Barzanî temenê wî gihêşt du saliyê, bavê wî Mistefa Barzanî bi mebesta piştevaniyê li Komara Kurdistanê li Mehabadê berê xwe da Rojhilatê Kurdistanê.
Di temenê 6 saliyê de Idrîs Barzanî li bajarê Kerbelayê bo yekem car çû ber xwendinê û heta rûxandina desthilata Padşahiyê li Iraqê û hatina Komariyê bi rêbertiya Ebdulkerîm Qasim di sala 1958an de, Îdrîs Barzanî bavê xwe nedît, lê di wê sale de Mistefa Barzanî û hevalên xwe ji Sovyêtê vegeriyan û piştî demeke dirêj ji dûrbûnê malbata wî pê şa bûn.
Li gor nivîsên Partiya Demokrat a Kurdistanê, piştî vegera Mistefa Barzanî ji Sovyêtê û serîhildana şoreşa Îlonê di sala 1961an de, Îdrîs Barzanî ji Pêşmergeyên yekem bû ku pêwendî bi rêza şoreşê kir û çek hilgirt û mil bi milê Pêşmergeyan beşdarî di destanên serkeftinên şoreşê de kir.
Îdrîs Barzanî di şoreşê de çendîn serkeftinên mezin tomar kirin, ku di destana Çiyayê Hindirîn de di meha Gulana 1966an de encam da û tê de hêza Pêşmerge karî li hember firqe û lîwayên artêşa Iraqê
Piştî 9 salan ji Pêşmergayetiyê û beşdarbûna di şoreşa Îlonê de, di meha Hizêrana 1970î de di kongreya 8emîn a Partiya Demokrata Kurdistanê de, bo yekem car Îdrîs Barzanî bû endamê Komîta Navendî ya Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK)
Îdrîs Barzanî di dîroka tevgera rizgarîxwaza netewî de bi endezyarê lihevhatina niştimanî hate binavkirin û di heman demê di neydana siyasî ya Iraqî de wek kesayetiyekî diyar û bi bandor tê hejmartin.
Roja 31ê Çileya 1987ê, li gundê Sîlwana ya ser bi bajarê Urmiyê, Îdrîs Barzanî koça dawî kir û li goristana Şino li tenişt bavê xwe Mele Mistefa hate veşartin.
Piştî raperîna 1991ê, li ser daxwaza serkirdetiya PDKê termê Mele Mistefa û Îdrîs Barzanî bo Başûrê Kurdistanê hatin veguhastin û li gundê Barzanê bi axê hatin spartin.

# 77 sal di ser damezirandina Komara Kurdistanê re derbas dibin



Komara Kurdistanê di roja 22ê Çileya 1946an de li Mehabadê hat damezirandin û Pêşewa Qazî Mihemed wek Serokomar sonda yasayî xwaribû.
77 sal di ser damezrandina Komara Kurdistanê re derbas bûn û aliyên demokrat di wê baweriyê de ne ku her çiqas temenê komarê kin bû jî, xwestek û daxwaza gelê Kurd bû ji bo damezrandina dewleta Kurdistanê û bûye sedema çêbûna çend hêmayên girîng ên Kurd, ku heta niha jî li her çar parçeyên Kurdistanê, Kurd li ser wan hêmayan yek in.
Berî 77 salan, Komara Kurdistanê li Mehabadê, li qada Çarçira hat ragihandin, komarek bi pêşendiya Pêşewa Qazî Mihemed, ku her weke di ragihandina yekem de hatiye, armanca wê, damezrandina komareke demokrat a Kurdistanê bû.
Her çiqas Komara Kurdistanê, li Mehabadê hat ragihandin, lê ji hêla Kurdistaniyên her çar parçeyên Kurdistanê dihat parastin.
Mela Mistefa Barzanî ligel hêzên Barzan, hêzên sereke yên parêzvanên vê komarê bûn. Parêzvaniyek wisa ku Qazî Mihemed ewqas pê bawer bû, berî îdamê, Ala Kurdistanê dabû wî destê emîn. Kabîneya Komara Kurdistanê bi vî rengî bû:

**Serok:** Qazî Mihemed
**Serokwezîr:** Hacî Babe Şêx
**Wezîrê Şer:** Seyfî Qazî
**Wezîrê Navxwe:** Mihemed Emîn Muînî
**Wezîrê Aborî:** Ehmed Îlahî Wezîrî
**Wezîrê Post û Telegraf:** Kerîm Ehmediyan
**Wezîrê Çand:** Menaf Kerîmî
**Wezîrê Propaganda:** Sidîq Heyderî
**Wezîrê Kar:** Xelîl Xusrewî
**Wezîrê Bazirganî:** Hacî Mistefa Dawûdî
**Wezîrê Çandiniyê:** Mehmûd Welîzade
**Wezîrê Rêk û Piran:** Îsmaîl Îlxanîzade
**Wezîrê Tenduristiyê:** Seyîd Mihemed Eyûbiyan
**Wezîrê Dewletê:** Ebdulrehman Îlxanîzade
**Wezîrê Dadê:** Mela Husên Mecdî
**Paytext:** Mehabad
**Dirav:** Riyalê Îranê

Her çiqas temenê Komara Kurdistanê tenê 11 meh bû, lê destpêkeke zelal û eşkere bû ji bo serxwebûnxwazên Kurdistanê. Lewra piştî ku Yekîtiya Sovyetê ligel hikûmeta wê demê ya Îranê li hev kir û di nav bêdengiya zilhêzên din de dawî lê anî û pêşengên komarê hatin darvekirin, lê piştî 75 salan, xewna serxwebûnê her maye û îradeyeke bihêz daye.

# Cotê Kevokan

Henan Cefer

Du kevok li ser sîvleka xanî naziyê xwe bi hev dikin bayekî har çav mistdan û rabû ewr diqdiqand, dema guhdarî çîroka wan kir bi evîna wan hêrs bû, ba hêgin bû bi tajana xurexura ewran re birûsk avêtin şirqînî li gerdûn da û baran hûr barî, kevokan bi germahiya evîna xwe – xwe ji serma û baranê parastin lê rûxweş li hewşê li bin dara mêwê bi êşa canê xwe re hêvî bi ava baranê av dida û bi kevokan re xewnerojkên jiyanê xwe bi teşiya daxwazan dihûnan êşa canê xwe û êşa jiyanê bibûn yek û yek car xwe dida hêz û evîndariya dilê xwe, her ku sancî lê diqewimî piştguh dikir û bi xwe re digot sanciye her serî çend rojan êş di malzarokê de dilivî û mina jehrê mar û çeteyan dêşiya. Rojekê li havîngeha sûlava gemrûkê bi maliyê xwe re şad û bextewar e êş ket hinava wê û bi badekê hat şidandin êtir nekir hayî bû li ser nivînê rûnişt û her du destên xwe kirin newqa xwe û zext kir bû axîn û nalenala xwe, mêr hayî bû dît rewş xirab e bi sibehê re diçin kilînîka bijîşk piştî ezmûn kir şandin wênegirtin û tehlîl kirinê bi hûrnirîn lê sekirin tiştê xuya kirî wermek di malzarokê de heye, derman dayê heya pazdeh rojan ger sûdar ne bû divê vegerê. Carek din vegerîn ba bijîşk bi hûrnirîn lê sekir li dawiyê gihîşt encamê werm penceşêr e bi vê nexweşiyê hemî awat û daxwazên xwe mina kevokên li ser sîvlekê firiyan tenê êş û sancî bûn hevrêya jiyana xwe pir caran xwe radestî penceşêr dikir. Rojekê her du cêwîyên xwe Perwîn û Sêvîn li hewşê bi hev re bi dilxweşî dilîzin, kela dilî bi wan re şax didê, hêvî û daxwaz li giyanê wê vegerîn mina şervanekî li enîya şer berevaniyê ji bo serkeftinê dikê, hêz û vîna xwe dest kirin destên hev ji bo cotê kevokên xwe wêrekî mîna çiyayê bîston evîna Mem û Zînê hembêz dike û li hember vêzevîza bayê dijîtîyê rawestî û pişta xwe da evîna keçên xwe. Çûn ba nijdar û nijdar rapor çêkir ji Efrînê şandin Dîlokê li nexwaşxaneyê carek din wênegirtin û tehlîl çê kirin û berî emeletê dosa Rûxweşê hanîn ba mêr wajo kir, Rûxweş birin benc kirin û dest bi emeletê kirin dema dîtin werm rîşal dayî, carek din çûn ba mêr agahî kirin û dîsa ji mêr xwastin şanenav bike, diçin malzarokê jêdikin dibirin xwînçûn dibê, gûj dibê yekser dibin oda komayê. Rûxweş li ber xwe didê mîna dara zêtûnê di çar demsalan de giyana xwe şîn be, tu caran li pêrgî dijberiyê nawestî û xwe nekir destê nexweşiyê, xwe hawldan can pê hat çavê xwe ji xewa mirinê vekir xwe dît li ser doşeka komayê ye hêdî hêza xwe komî ser hev kir heya wê demê sister jî hat matmayî ma bi vê diyarde û derhozeya xweda, giyan lê vegerî lê sister nizanî bi evîna her du cêwî yên xwe vegerî û bi vê şêweyê li mal û zarokên xwe vegerî. Bi dilxweşî bê êş û êşkence her du keçên xwe hembêz kirin û maçkirin û gote wan, we ez ji mirinê kuta kirim hezkirin û paşeroja we hêşt tova wêrekiyê di giyanê min de zîl bide, hûn her du kevokên li bihara dilê min in ez ji we hez dikim û herduyan li ber bejna xwe ve dike.

-Bi dawiya dibistanê re diçê herdu keçên xwe li dibistanê tomar dike û hêvîdar e ku sala din rewş baştir bibe û zarok herin bi ewlehî bixwinin sala din Perwîn û Sêvîn diçin dibistanê herdu gelek benzî hev in tenik, dirêj û rûgeş in mina diya xwe rûhenarî ne, cil yek reng pêlav yek reng û her yekê du keziyên xwe bi pînpînokê xemlandî, li dibistanê demê çavê mamoste li Perwîn û Sêvînê ket çav çûn ser serî û mîna kêrekê li dilê wê ket gerek serpoş bana ev keç in lê mixabin bi erebî jî nizanîn bipeyvin, dema vegerîn mal lê mamoste hin tîp li ser nivîsarê nivîsîbûn diya wan ew fêrî xwandina tîpan kirin li dersxanê ji keçên ereban jîrtir bûn ji dexesî bûnan porê wan dikişandin û direvîn carcaran diya wan diçe dibistanê giliyê dike lê mamoste piştguh dikir lêbelê diya wan ew fêrî peyv û xwandina erebî dikir lê a baş di mal de dan û standin bi kurî bû û bi kurdiya xwe serbilind bûn.

-Rojek havînê ye danê îkindî ye aram bi jin û keçên xwe re dibêjê xwe têz bikin emê herin mala birayê min di ci de Pêrwîn û Sêvîn li ser tiliyên lingê xwe sema kirin û bi hêlehêla şadîman bûn bezîn bilez xwe amade kirin, Perwîn û Sêvînê bi diya xwe re gotin emê biçin markêtê tehimtîtikan bikirin heya hûn tên emê li bendewariya we bin, dê û bav piştî kurtedemekê ji mal derketin li pêş dergehê male dîtin Perwîn û Sêvîn ji markêta bavê Cîwan derhatin piştî du – sê pêngavan ji tirimpêla li pêş marketê dûr ketin ji nişke ve tirimpêl teqiya deng, dûman, agir û qîrîn û bêhna qijilê bûn yek, cam şkestîn bû qîreqîra xelkê, kolan ji dû û xulxanê xetimî û pir sivîl birîndar bûn, Rûxweş di ci de gêj bû û ket, dilê Aram li hawara jinê bû û çavên xwe li Perwîn û Sêvînê digerîn ax û ahîn lê civiyan piştî kurtedemekê berevaniya sivîlan hatin termê perçe û şewitî. Kirin tûrên reş û birîndar birin. Di wê demê Rûxwaş hayî bûyî de Aram wê de çû rûpelek nîv şewitî dît li ser nivîsandin e"kurd cudaxwaz û cihû ne" di wê tengasiyê de hat bîrê çawa hevalê wî Azad bi êşkencê kuştin.

# Komeleya Kurdî-Elmanî li Schleswig-Flensburg hate damezirandin



Kurdistan-Elmaniya
Li bajarê Schleswig-Flensburg yê Elmanyayê, damezrandina Komeleya Kurdî-Elmanî li Schleswig-Flensburg hate ragehandin. Serokê Komeleya Kurdî-Almanî li Schleswig-Flensburg Amed Doskî ji rojnameya Kurdistan re ragihand, armanca wan ji vê komeleyê, nasandina çanda Kurdî, piştgirîkirina Kurdên ku li Elmanyayê dijîn, vekirina xulên fêrkirina ziman, danîna pêwendiyê bi Herêma Kurdistanê re di warên cuda de û peydakirina piştgiriyê ji bo her çar perçeyên Kurdistanê re ye.

Destnîşan kir jî, li bajarê Schleswig-Flensburg gelek dostên Kurdan hene û ew bi hev re hewl didin piştgiriya Kurdan li her cihekî bikin. Derbarê zimanê Kurdî de jî Amed Doskî da zanîn, projeyeke wan heye ji bo pêwendiyê di navbera dibistanên Schleswig-Flensburg û dibistanên Herêma Kurdistanê de ava bikin, ji bo ku xwendekarên Kurd fêrî zimanên Kurdî binin.

Destnîşan kir jî, berî belavbûna vîrûsa Koronayê, wan bi riya komelên din, xulên xwebexş ên fêrkirina zimanê Kurdî vekiribûn, niha jî ew hewl didin bi riya vê komelaya Kurdî – Elmanî xulên din ên fêrkirina zimanê Kurdî vekin. Ji aliyekî din ve, Endama Desteya Serokatiya Komeleya Kurdî-Elmanî Sylke Willig ragehand: "Bi şanazî ve, îro em dikarin bibêjin ku damezirandina Komeleya Kurdî-Almanî li devera me hate ragehandin, bi rêya vê komeleyê em bi dilxweşî dixwazin xelkê ku li herêma me dijîn, bi rewşa Kurdên li her deverê û Kurdistanê bi giştî agahdar bikin. Em dixwazin li ser rewşa Kurdan şirove bikin û em ê hewil bidin gelek çalakiyan encam bidin."